

Ji Folklorê Çiyayê Kurmênc (Kurdaxê)

Meyrema Miho Begê

Berhevkerin û nivîsandin : Hêvî Êzîdxelo

Hûmihêrtina zimanî : Can Êzîdxelo

Lêveger : Dengbêj Bavê Selah

Lê de yar yar ...

Yarî Meyro min go te li girî tê, wa min li girî tê

Rojikê ez î rûnistibûm min balê xwa danê

Zîrkizîrka darê me yî xênî tê

Min go hebê bayê berî baranê rabiye¹

Tavike ji tavê buharê hêdî tê

Ya min go hebê ewîl û maxwîlêd² Serqiyên û Beraza

Daketine desta Sirûcê

Ji xwa ra dilîzin bi cirîtê

Ya min go hebê berfê kubêse³

Li serî çiya diwerivê⁴, dengê Feratê me yî jêrî tê

Feratê me rabiye li hêlî⁵ tê

Di ortê ra avê meyî tê

Di ser ra kef û kupikê⁶ sipî tê

Di destê ra avê zelal ê belav dibê wek çigîtê⁷

Wê çaxê derketim derva

Min balê xwa danê Meyrema Miho Begê

Li ser zîrkizîrkê qondira

Ji mehela me jêrî tê

Law nizanim ji mala qêdî tê

Nizanim ji mala miftî tê

Nizanim ji mala bavê xwa yî gidi⁸ tê

Di linga da dengê kerikê qondira zîvî tê

Bi dest da bi çeqipeqa gopalikî kinêrî⁹ tê

Sîng û berê Meyremê mîna textê kerewîtê¹⁰

Memikê vê zalimê weke tenê hermûtê

Law bi kirasikî merezî¹¹ tê, bi gerdênê xelawî¹² tê

Lêv ê dilivine mîna qelemê derê ser divîtê¹³

Wî de yar yar yar yarî Meyro

De yar yar ...

Lê yarî yarîne yarî yarîne ...

Bi dêv dostê, dil xayîne

Di ser min ra yar û dosta dibîne

Dil kiriye Mihemedê Meshîne

Min xwa berda çelîka¹⁴ desta Sirûcê

Li ortê gundî Elîgor sesê û Metîne

Ne min balê xwa dayê def û dîlanik ê lêdixîne

Erê Meyrema Miho Begê

Ketiye serê dîlan û govendê serkês e û dikisîne

Desmalike herîrî xistiye nav tili(h) - pêçiya

Her gu carê çavê res û belek

Biri(h) bijanga¹⁵ li min hiltîne

Erê dibê gurigurê êstira

Bi ser dîmê xwa da dibarîne

Law dîlan û govenda vê zalimê

Nebiye¹⁶ dîlan û govenda

Tawîr Begê Lawîn û Lewnd Pasa

Li serê kela Mêrdîne

Her gu carê kirîf¹⁷ gopalikî¹⁸ lêdixîne

Vê zalima dusid û ses çiva

Bi bejin û balava¹⁹ xwa dixînê

Erê çiqâ(s) keç û bûkê desta Sirûcê

Heyanî desta Silopiya, heyanî desta Cîhanê

Hilnayê di rindbûn û law di mizgînê

Ez ê nifirekê bikim :

Xudê malê oste û ostekara

Li bajarî Wêransarê bi sêri da²⁰ bisewtînê

Ji Meyrema Miho Begê ra qondirike teng çêkirine

Kerikî xwa ê zîvînê, bi ser da berdane çar gupikê zêrînê

Law mêratê qondirê teng çêkirine

Wey ez bimirim (h)istê min biskê

Seyî linga diguvisê

Pêçê qilîçê²¹ diêsînê

Wey de yar yar yarî Meyro

Yarî Meyro yarî Meyro

Min go ji hêvara Xudê da baran barî

Ji nîsev²² bi sûn da berfê lêkir²³

Bi sibê ra kurba²⁴ ket û erd qemiti²⁵

Erê min dî Sêxo lawê gulî Serqiya

Sîwar bû li hespê dakete ji wî girî²⁶ û

Law ji wê girmiti²⁷

Li kêleka mala Meyrema Miho Begê

Lingê hespê pasin li ê pêsin disimitî

Wê çaxê lawik ji ser daket û daniqitî

Erê bira çiqas ewîl û maxwîlêd Serqiyân û Beraza hebûn

Li vî hespî civiyan, tê bibê bû bergîrikî xure²⁸

Û bû meytê Ereba ji heft sala vir da ma û

Law nelehbîti²⁹

Wê çaxê xeber dan Meyrema Miho Begê

Mala bavê Meyremê bisewitê li ber darî bedel-eynesiyê³⁰

Di bejin û balava xwa dixebitî

Erê wê çaxê bejin û balav dida ber

Çek³¹ û dûzanê, xemlê û xêzê

Siwar bû li cotî qondira bi kerikî qondirê

Lêda, go :

"Serê mala bavê min xwaro"

Erê wê çaxê hespê lêwik

Bû nêrîkî ji nêriyê xefs û xezala

Li çelîka desta Sirûcê, ji pêse awcî³² û segvana

Ji bin tûmê gewrîkê³³ difilitî

Lomekara lome kirin, gotin :

Qîzik a zengîn û xwanedan e,

Lawik î sêfil î perîsan e

Dilê keçikê bi lêwik pir sewitî

Wî de yar yar ... yarî Meyro

Lê de yar ... yar

Li rojê hezar û hefsid car

Ez ban(g) dikim dibêjim yar

Heta serê xwa datînim kêla kevirî axa sar,

Ez ê ban(g) dikim dibêm :

De yar yar yar ... Yarî Meyro

Lê lê Meyremê ...

Lê lê Meyremê :

Min go tu biye³⁴ kurmik ji kurmê Eyob³⁵

Tu ket canê min û te gostê min xwar

Li ser min û pêsirê min lawikî Xudê

Peyda kirî barik ji barê lokê³⁶ desta Mûsilê,

Çifte qentar³⁷

Te di bin da, erê pista min haniye xwar

Lê lê Meyremê :

Lê Meyremê malê te neketê

Min go heçî di mabênê min û du dila kevê

Wey Xudêyo bi xwîn û dilekî sar :

Erê bila cotî xwa biskê

Li pêse malê nemînin ne golik û law ne dewar

Erê meskê xwa hisk bimînê li dar

Li pêse malê nemînin ne berx û ne kar

Erê hene, bûk û zava di malê xwa da nebînê

Bimînê ber dîwar

Erê cîwarê wî bi kavi bê

Li pêse malê netên dîndin³⁸

Law ne gul û ne çiçek û ne dar

Lê lê Meyremê, tu were destî xwa bi destî min de

Em ê derkevin ji vê gundî me yî gunekar

Li vê gundî, nabê ne jîyan û ne debar

Ramûsanê kinik Meyrema Miho Begê

Li min kirine axiya Mehrê Teyar³⁹

Lê lê Meyremê tu were

Em ê xwa bavên pas axakî Kurmancî yê

Mîna Hemê Hekar, eger debara min û te va

Li wir nebû, em ê xwa bavên⁴⁰ pas Eliyê Betê

Peyayî Kurda yî xedar⁴¹

Eger debara min û te va li wir nebû

Lê em ê xwa bavên zareta

Ebû Muslimê Xuresanî

Ya Ebû Muslimê Tobedar

Eger debara min û te va li wir nebû

Zanibe bi me ra çep geriya feleka neyar

Wey de yar yar yarî Meyro

Lê de yar yar ...

Lê lê Meyremê :

Min go bak rabû ji serê Çayê⁴² Gewr da

Dakete desta Sirûcê,

Lê Meyrema minê vingevîng e

Erê konê Meyremê dihejiya

Wê çaxê Meyrema Miho Begê

Rakire toqmaqîkî kinêrî

Lê dixist li nav çavê singe

Erê toqmaqê kinêrî lêkete li caxa⁴³ linge

De min go vê rojê sêsemê

Hêvarik li hêvarê çarsemê

Ez ê bibim hekîmê vê Meyremê

Eva yê li min bikê çî dermanî

Ez ê lê bikim çî Melhemê

Wê çaxê min xwa da benda

Vê serxos û vê sersemê⁴⁴

Belê biskê xwa verisandin

Ji bin salê û wa ji bin herdemê⁴⁵

Law bisk û guliyê Meyrema Miho Begê

Erê ne bûne mîna marê Sêx Mend e

Pêsa deriyê kela Helebê⁴⁶

Erê wê çaxê min balê xwa dayê

Biri(h) bijangê xwa kevanî ne

Ne bûne çatme⁴⁷ û serderê⁴⁸ kela Dimdimê

Lê de yar ...

Wê çaxê min balê xwa danê

Çav ê res û belek in

Mînane morîk û mircanê li nav pêlê Qelzemê⁴⁹

Qirikê xwa mîna sîsê Lewentê⁵⁰

Erê xal û nîsanê lê hene

Çê nabin ne bi xam⁵¹ û law ne bi qelemê

Sîng û berê Meyrema Miho Begê

Mîna xezîna Siltan Silêman e

Ez ne yî xoce me, ne yî îmamî camiya me

Ne yî mile me, ne cadûbaz⁵² im

Law ez ê ço(n) vekim bend û girêkê telasemê⁵³

Erê ji jana birînê xu(h) didê

Law xudana ser memikê vê zalimê

Ne mîna pisîneka⁵⁴ berî berfa hûr e

Weke xunavê sibê li ser pelê gulê

Erê jal⁵⁵ û xunava li ser memikê Meyrema Miho Begê

Hezar û hefsid car xwastir in ji ava zemzemê

Ax de yar yar yarî Meyro

¹ Rabiye : rabûye.

² Maxwîl : boke, leheng, pêlewan.

³ Kubês : berfa ser hev mayî û hevgirtî.

⁴ Diwerivê : dadirive, ji darivtinê.

⁵ Hêlî : bilindî, ji hêl : bilind.

⁶ Kupik : kefa ser avê; dema av li hev dikeve.

⁷ Çigît : çivît.

⁸ Gidî : di vir de, bi wateya xizan û geda hatiye.

⁹ Kinêrî : ji dara Kinêrê, dareke çiyayî ye.

¹⁰ Kerewît : kenebe, dîwan.

¹¹ Merezî : merz, mûyê nerm û rengîn, mohêr.

¹² Xelawî : zirav û dirêj, gerdenê xelawî : gerdengaz.

¹³ Divît : ximav, merkeb.

¹⁴ Çelîk : di vir de, bi wateya navik û navend hatiye.

¹⁵ Bijang : mijank, mijgul, mijlank.

¹⁶ Nebiye : nebûye.

¹⁷ Kirîf : mitirb, mirtib.

¹⁸ Gopal : çovê/çoyê defê yê mezin.

¹⁹ Balav : bal.

-
- ²⁰ Bi sêri da : bi seriyê wan de.
- ²¹ Qilîç : tiliyê herî biçûk.
- ²² Nîsev : nîvsev.
- ²³ Lêkir : barî.
- ²⁴ Kurba : bayê kur.
- ²⁵ Qemitî : dema ax dibe herî û simîtokî dibe.
- ²⁶ Gir : til, devera ji derdorên xwa bilindtir.
- ²⁷ Girmît : gir-mit, girê ku wek mitan dixuye.
- ²⁸ Xure : bê hêz, hebitî, jihevketî.
- ²⁹ Nelehbitî : nelebitî, bê liv ma.
- ³⁰ Bedel - eynesiyê : darê eynê/neynikê.
- ³¹ Çek : jê çekkirin, çêkirin : qenc û rindkirin.
- ³² Awcî : nêçîrvan.
- ³³ Tûmê gewrîkê: dareke çiyayî ye, di nav hev de û bi strî ye.
- ³⁴ Biye : bûye.
- ³⁵ Eyob : Pêxember Eyûb. Tê gotin ku kurm ketibûn lasê wî û hêdî hêdî gostê wî dixwarin, lê dîsa jî ra henasa xwe ya dawiyê, bi hezkirina xwe ya ji Xwedê re girêdayî bû û her navê Xwedê li ser zimanê wî bû.
- ³⁶ Lok : hêstirê/ deveyê nêr.
- ³⁷ Çifte qentar : du barên giran.
- ³⁸ Dîndin : dîtin.
- ³⁹ Marê Teyar : marekî efsaneyî ye.
- ⁴⁰ Xwa bavên : xwe bavêjin.
- ⁴¹ Xedar : no, jîr û jêhatî.
- ⁴² Ça : çiya
- ⁴³ Cax : hestiyê pêsi yê lingan.

-
- ⁴⁴ Sersem : sersam, sergêj, mest.
- ⁴⁵ Herdem : cureyeke ji sar, desmal, û salan e.
- ⁴⁶ Marê Sêx Mend ... kela Helebê : tistê balkêş ew e ku, ra niha li pêsiya deriyê kela Helebê du mar nexisandî hene, her marek li aliyekî derî ye.
- ⁴⁷ Çatme : qentere, nîvgilover.
- ⁴⁸ Serder : nexsa ser deriyan.
- ⁴⁹ Qelzem : deryaya sor.
- ⁵⁰ Lewent : lewend, cehîdok, giyayeke bihxwes e.
- ⁵¹ Xam : xame, pênuş.
- ⁵² Cadûbaz : sihirbaz, nependînas.
- ⁵³ Telasem : telesem, enîgma.
- ⁵⁴ Pisînek : xunava hûr ya berî berfê.
- ⁵⁵ Jal : dilopên avê yên li ser pel, çilo û giyayan dimîne..
-

Têbînî :

Ev strana ji devê dengbêj Bavê Selah hatiye girtin. Hîn pir dengbêjên çiyayê Kurmênc ev kilama strane, lewma pistî biserîkirina nivîsînê, ez ê wan di berhevokekê de belav bikim. Hêvîdar im tu kes bê destûr, ji ber negire û di ti cihên din de belav neke.